

Hejmara - 192

Bê dirave

MIZGÎN

15 - Îlon - 2025



Naverok

1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros
Rojhilat

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Di wêneya li jêr de
avpijînê reng bikin

لَوْنِ النَّافُورَةِ فِي
الرَّسْمِ الْمُرْفِقِ.



Ho mişko mişko mişko
 Mîrê mişkan e
 Hev dane ber ingûşka
 Şêrê mişkan e
 Ser parî nanê hişk e
 Mîrê mişkan e
 Şev û roj xirepişk e
 Şêrê mişkan e
 Pisîkê simbêl ba dan
 Mîrê mişkan e





Mişk revîn ber enîşka
 Şêrê mişkan e
 Hebanê me reqreq e
 Mîrê mişkan e
 Mişka kirye deqdeq e
 Şêrê mişkan e
 Paşîva mişko keşk e
 Mîrê mişkan e
 Nîvişkê nava meşk e
 Şêrê mişkan e



Bi xêzekê lawiran û xwarina wan ya jê hez
dikin, bighîne hev

صَلِّ كُلَّ حَيَوَانٍ بِمَا يَنَاسِبُهُ مِنْ طَعَامٍ






Til Erbîd

تلُّ عَرَبِيد

Ev gir li Rojavayê Kurdistanê, di navbera bajarên Heseke û Qamişlo de ye, ne mîna girekî asayî ye. Ew mîna çiyayekî biçûk e ku berî hezarên salan ji aliyê mirovan ve hatiye çêkirin. Her qatek jê çîroka şaristaniyekê ku li wir jiyaye, vedibêje. Ew vedigere dawiya hezarsala sêyemîn berî zayînê, di kolandinan de qatên ku şaristaniyên Akadî, Hûrî, Mîtanî û Asûrî temsîl dikin, hatin vedîtin. Lêkolîneran diwarên kerpîç û avahiyên mezin li ser lûtkeyê, goristaneke padîşahî ya sedsala 15'an berî zayînê ku tê de koşkek û gencîneyeke ji zêr, kevirên zimurid û du mohrên zêrîn, dîtin! Herwiha wan amûrên qafikî yên hêja, bêhempa, şopên mohrên ji axê û bûkên piçûk ên ji axê, dîtin.

يقع في روج آفا كردستان، بين مدينتي الحسكة وقامشلو، هذا التل لا يشبه التل العادي، فكأنه جبل صغير صنعته البشر منذ آلاف السنين - كل طبقة تحكي قصة حضارة عاشت هناك. يعود إلى أواخر الألف الثالث قبل الميلاد، والحفريات أظهرت طبقات تمثل الحضارات: الأكادية، والهورية والميتانية، والآشورية. اكتشف فيه الباحثون أسواراً وأبنية ضخمة من الطوب على القمة، ومقبرة ملكية من القرن ١٥ ق.م، فيها قصر، ووجدوا فيه كنزاً من الذهب وأحجاراً كريمة وختمين ذهبيين! وأدوات فخارية رائعة، وطبعات ختم طينية ودمى صغيرة من الطين.




Mezintirîn lawir di cîhanê de
nehengê şîn e, dirêjahiya wî
dighêje 30 mitireyan

أَنَّ أَكْبَرَ حَيَوَانَ فِي الْعَالَمِ هُوَ الْحَوْتُ الْأَزْرَقُ!
يَصِل طَوْلُهُ إِلَى أَكْثَرَ مِنْ ٣٠ مِتْرًا.

Û kevintirîn lawir ku naskirî ye, kîsoya
girs "Consan" e. Ew li ser giravekê li
.oqyanosê dijî û temenê wê 190 sal e

وَأَنَّ أَقْدَمَ حَيَوَانَ مَعْرُوفٍ هُوَ السَّلْحَفَاءُ الْعِمْلَاقَةُ
"جوناثان" تعيش في جزيرة في المحيط، وعمرها أكثر
من ١٩٠ سنة!



Û Biçûktirîn lawirê
naskirî biqeke biçûk e
navê wê Paedophryne
amaensis e. Ew li
Babo Gîniyaya Nû
jiyan dike, dirêjahiya
wê ne zêdeyî heft
milîmitre

وَأَنَّ أَصْغَرَ حَيَوَانَ مَعْرُوفٍ هُوَ
ضَفْدَعٌ صَغِيرٌ جَدًّا يُسَمَّى
Paedophryne amaensis
يعيش في بابوا غينيا
الجديدة، وطوله لا يتجاوز
سبعة ميليمترات فقط!

Garis...Libikên enerjîyê

Tu ji garisê biraştî an kelandî hez dikî?

Garis ne tenê xweş e, di heman demê de ji bo tenduristiya zarokan jî gelek sûdên wê hene!

Karbohîdratan dihewîne, ku enerjîyê dide we ji bo lîstin û xwendinê di tevahiya rojê de.

Bi vîtamîna B dewlemende ku ji bo mezinbûna mejî û zêdebûna baldariyê girîng e.

Fîberan dihewîne ku alîkariya helandinê dikin û zik paqij dikin.

Madeyên ku ji bo parastina çavan kêrhatî ne, dihewîne.

Ew dewlemende bi kanzayên wekî megnezîyom û çingo ku ji bo hestî û diranan sûdmend in.

Hevalên min, divê em jibîr nekin ku dema ew tê germkirin dibe bûşar, ji ber ku ava di hundirê wê de dibe hilma avê û qalik diteqe!

الذَّرة...حبوبُ الطَّاقةِ

هَلْ تُحِبُّ الذَّرَّةَ الْمَشْوِيَّةَ أَوْ الْمَسْلُوقَةَ؟
الذَّرَّةُ لَيْسَتْ لَذِيذَةً فَقَطْ، بَلْ هِيَ مَلِيئَةٌ بِالْفَوَائِدِ الصَّحِيَّةِ لِلأَطْفَالِ.
تَحْتَوِي عَلَى الْكَرْبوهِيدْرَاتِ الصَّحِيَّةِ، الَّتِي تُعْطِيكَ طَاقَةَ لِلْعِبْ وَالْأَدْرَاسَةَ طَوَالَ
الْيَوْمِ.

وَهِيَ غَنِيَّةٌ بِفِيْتَامِينِ B الضَّرُورِيِّ لِنَمُوِّ الدِّمَاغِ وَتَحْسِينِ التَّرْكِيزِ.
فِيهَا أَلْيَافٌ تُسَاعِدُ عَلَى الْهَضْمِ، وَتَنْظِفُ البَطْنَ.
تَحْتَوِي عَلَى مَوَادِّ مَفِيدَةٍ لِحِمَايَةِ الْعَيْنِ.
غَنِيَّةٌ بِالْمَعَادِنِ مِثْلِ الْمَعْنِيسِيُومِ وَالزَّنْكَ، الْمَفِيدَةِ لِلْعِظَامِ وَالْأَسْنَانِ.
أَصْدِقَائِي، وَعَلَيْنَا أَلَّا نَنْسَى الذَّرَّةَ، الَّتِي تَتَحَوَّلُ إِلَى (بُوشَار) عِنْدَ التَّسْخِينِ! لِأَنَّ
المَاءَ فِي دَاخِلِهَا يَتَحَوَّلُ إِلَى بَخَارٍ فَيَنْفَجِرُ الغُلَافَ.





Hevalno, werin em bi hev re Dr. Safiya Zevenkî nas bikin.

يا أصدقاء! لنتعرف معاً على الدكتورة صافية زفندي

Ew lêkolîner û zimannaseke afirîner e, xwediya nasnava "Profesora hempazî" e, û li ser dîroka Kurdan gotar û lêkolînan dinivîse.

Dr. Safiyia Zevenkî pirek di navbera ziman û çandan de ye, ferhengan çêdike ku têgihîştina me ya cîhana li dora me bi bêtirî zimanekî hêsantir dike. Me fêr dike ka em çawa rêzê li cudahiyên xwe bigirin û ji hev fêr bibin. Bi saya wê ferhengek ku ji me re dibe alîkar da ku em peyvên Erebi, Kurdî û Îngilîzî fam bikin, an jî gotarek ku rave dike ka ziman çawa dikarin bi renekî xweşik bi hev re bijîn, hat afirandin.

هي باحثة وعالمة للغات مبدعة، تحمل لقب "بروفيسورة فخريّة"، وتكتب مقالاتٍ ودراساتٍ عن تاريخ الكرد.

الدكتورة صافية زفندي هي جسر بين اللغات والثقافات، تؤلف معاجم تسهل علينا فهم العالم من حولنا بأكثر من لغة، وتعلمنا كيف نحترم اختلافاتنا، ونتعلم من بعضها. لها الفضل بإيجاد معجم يساعدك على فهم الكلمات العربية والكردية والإنجليزية، أو مقال يشرح كيفية تعايش اللغات سوياً بشكل جميل.

Hin Navên
bi tîpa - **D**

Dîlan

Dicle

Dîmav

Dilara

Dilbax

Dilovan

Deştî

Dara

Desmalkên Şil

المحارمُ المبللة



Ma hûn dizanin dema ku em li bexçe an jî di rêwîtiyekê de ne û destên me qirêj dibin, em çi dikin?

Hevalên min, carinan sabûn û av li gel me tune ku em destên xwe bişon, lê ev nayê wê wateyê ku divê em destên xwe qirêj bihêlin.

Çareserî ew e ku em her gav qutiyek piçûk ji paqijkera destan an jî destmalên şil bi xwe re bibin. Ev destmal madeyên paqijker dihewînin ku ax û mîkroban radike, ji ber vê yekê em dikarin dema ku em digihîjin malê destên xwe bi sabûn û avê baş bişon.

Lê ji bîr nekin!

Piştî bikaranînê, wan bavêjin çopdankê, navêjin kolan an bexçe! Werin em parastina paqiya jîngeha xwe bikin.


هل تعرفونَ ماذا نفعلُ عندما تتسَخُّ أيدينا، ونحنُ في الحديقةِ أو في رحلة؟

أصدقائي في بعض الأحيان، لا نجدُ ماءً وصابونًا لغسلِ أيدينا، لكن هذا لا يعني أن نتركها متسخة.

الحل هو أن نحمل معنا دومًا علبةً صغيرةً من المعقَّم أو المحارم المبللة الخاصة بتنظيف اليدين. هذه المحارم تحتوي على مواد لطيفة تزيل الأوساخ والجراثيم؛ حتى نصل إلى البيت، ونغسل أيدينا جيدًا بالماء والصابون.

لكن تذكروا!

يجب رميها في سلة المهملات بعد الاستخدام، وليس في الشارع أو في الحديقة! لنحافظ على بيئتنا نظيفة.



Hevalên min ên xweşik di Kovara Mazkin de
me ji we pirsîbû:
Eger çirayeke sêrbaz bi daxwazek te hebûya... tê çi bixwazî?

أصدقاءني الحلوبين في مجلة مزكين
سألناكم:
لو كان عندكم مصباح سحري بأمنية واحدة... ماذا سئتمنون؟



Ibrahîm Ridwan Hesen:

"Xwezî dêwê di çirayê de bibûya hevalê min ê herî
baş û em bi hev re biçin serpêhatiyên û her gav
alîkariya hev bikin!"

إبراهيم رضوان حسن:

"أتمنى أن يصبح مارذ المصباح صديقي المقرب. ونقوم معا
بالمغامرات. ونساعد بعضنا دائما!"

Naya Mutesim Lêl:

"Xwezî dêwê çirayê alîkariya min bikira ku ez
bibim bijîşk û em bi hev re li seranserê cîhanê
aştîyê belav bikin!"

نايا مهتسم ليل:

"أتمنى أن يساعدني مارذ المصباح: لأصبح طبيبة. وكذلك نتعاون معا
لنتشر السلام في كل أنحاء العالم!"



Elend Bedran Elî:

"Xwezî dêwê çirayê alîkariya min bikira ku ez
bibim hunerbazekî navdar û beşdarî filmên bi
wate bibim!"

آلند بدران علي:

"أتمنى أن يساعدني مارذ المصباح أن أصبح ممثلة مشهورة.
وأشارك في أفلام هادفة!"



Çîroka : Firoşkarê Sebzeyan

Binêrin! Apê Şêrgo wekî her car bi erebeya xwe hat.

Êw her tim sebzeyên teze difiroşe û bi dengê xwe yê xweş gazî me dike.

Divê em bi lez alîkariya wî bikin

Em wî bi tenê nahêlin

Erebeya min!!!

spas ji bo we
zarokên min, lê ez
naxwazim we aciz
bikim

Na na! em
kêfxweşin ku
alîkariya te bikin

Ez ê bacanan kom
bikim û di sindoqê
de rêz bikim

Ka bi hev re!
Yek...Du...Sê

Ez ê jî gêzer û
pîvazan kom bikim

Niha erebe wekî nû
xuya dike, wekî ku
tiştêk nebûye

Hûn pir baş in,
zarokên min! Ez ji
dilê xwe spasiya we
dikim



Ev diyariyeke bi çûk ji we re hevalên heja

Lê me ne ji bo diyariyan ev tişt kir


Hevkarî her tiştî hêsan dîke

Ez kêfxweşim ji ber ku me alîkariya Apê Şêrgo kir

Lê her kesê ku alîkariyê bike, her tim xêrê qezenc dîke


Bi xatirê te apê Şêrgo

Sibe em ê hev bibînin



Hevkarî me
bihêztir dike

Û kesê başiyê
bike wê ew başî
lê vegere



pêwêst e em her dem amade bin
ji bo alikariya kesên ku pêwîstiya
wan bi alikariya me heye.



Rêwî
مُسَافِرٌ
Passenger



Pîlot
طَيَّارٌ
Pilot



Balafirgeh
مَطَارٌ
Airport



Balafir
طَائِرَةٌ
Plane

Çavika Mizgîn

عدسة مركزين



مزكينة

15 - أيلول - 2025

